WEŞANA RÊXISTINA AMADEKARÎ Û PARASTINA NETEWEYÎ YA KOÇBERÊN LI FÎNLANDIYAYÊ

#2
Gulan 2026

# KANTAMA

*BI HEV RE — FÎNLANDIYAYEKE EWLETIR*

## Ewlehiya Fînlandiyayê berpirsiyariya her yek ji me ye

*Ewlehî ne tenê bi biryarên desthilatdaran, artêşê an hêzên siyasî tê avakirin. Ew di jiyana rojane de, bi berpirsiyariya hevpar û bi amadebûna ku em li kêlekan nemînin, tê xurtkirin*



**HEVPEYVÎN**

**Ezmûna her kesî dikare rewşê biguherîne**

Antti Pekko Puhakka diyar dike ka çima ew dema xwe ya vala ji bo parastina sivîl û amadekariya ji bo rewşên awarte veqetîne

**SERGOTAR**

**Ewlehî — qada nû ya xebata me ye**

Armanca MVM ew e ku beşdarbûna mirovan di civakê de û amadekariya wan ji bo rewşên cuda xurt bike. Bi derbasbûna ji temaşekirinê ber bi çalakiyê ve, em bi hev re Fînlandiyayeke ewletir ava dikin

**RÊNIMAYIYA XWEAMADEKIRINÊ**

**Berî havînê agahiyên girîng bibînin**

5 şîretên pratîkî ku alîkar dikin hûn ji bo rêwîtiyan, çûna ser malê havînê û rewşên awarte çêtir amade bin

*EWLEHÎ DIVÊ TU CARÎ NEYÊ DABEŞKIRIN NAVBERA "YÊN ME" Û "YÊN DIN"*

*EWLEHIYA FÎNLANDIYAYÊ MIJARA ME HEMÛYAN A HEVPAR E*

# NAWEROK

KANTAMA #2 Gulan 2026


**03** — **Gotara Rêveberê Giştî**
Bawerî bi kiryaran tê avakirin. Bi hevkarî em ewlehiya civakê xurt dikin

**04** — **Sergotar**
Ewlehî pêşengiya nû ya me ye: bi beşdarbûn û amadekarî em ber bi Fînlandiyayeke xurtir ve diçin

**05** — **Rênimayiya Xweamadekirinê**
Berî havînê agahiyên girîng kontrol bikin.
5 şîretên pratîkî ku alîkar dikin hûn ji bo rêwîtiyan, çûna ser malê havînê û rewşên awarte çêtir amade bin

**06** — **Jin di refên pêşî de**
Rola jinan di ewlehiya civakê de bêhempa ye — bi ezmûn, nêrîn û kiryarên wan

**07** — **Çalakî**
Bûyer û hevdîtinên ku civaka me xurt dikin

**08** — **Dengê ciwanan**
Dengê ciwanan
Ewlehî ji bo ciwanan çi wateyê dide û ew çawa dixwazin beşdarî avakirina pêşerojê bibin

**09** — **Kuncika Pisporan**
Analîza pisporan li ser mijarên heyî yên ewlehiyê û nêrînek ber bi pêşerojê ve


**10** — **Hevpeyvîn**
Şiyanên her kesî dikarin girîng bin. Hevpeyvîn bi Antti Pekko Puhakka re

**11-12** — **Rojêv**
MVM qedirgirtin distîne.
Daxuyaniya Encûmena SPEK









BI HEV RE EM FÎNLANDIYAYEKE EWLETIR AVA DIKIN

Spas ku hûn bi me re ne

## Gotara Rêveberê Giştî

# Baweriya rastîn bi kirinan pêk tê

*«Pêbawerî» peyveke mezin e. Nabe ev peyv tenê di gotar û axaftinan de dubare bibe. Pêbaweriya rastîn bi gotinan nayê bidestxistin, belkî bi kiryaran tê afirandin. Divê ev kiryar roj bi roj berdewam bin; heta astekê ku xelk bi dil û can hest bi hebûna wê bikin û bawerî pê bînin.*

Pêbawerî bi hêdî-hêdî tê avakirin, lê dibe ku bi lez û bez jî têk biçe. Lewma her kiryarek, her awayê danûstandinê û her sozdayînek giring e. Di jiyana rojane de pêbawerî di hûrgiliyan de xwe nîşan dide: di silavkirinê de, di guhdarîkirinê de, di rastgoiyê de û di çawaniya rêzgirtina me ya ji hev re. Gava mirov hest dike ku tê dîtin û rêz lê tê girtin, hesta ewlehiyê çêdibe.

---

Di navbera koçberan û xelkê resen ê Fînlandiyayê de, pêbawerî xwedî girîngiyeke taybet e. Pêbawerî bi gotarên xemilandî nayê avakirin, çimkî piraniya kesên koçber çûne, dibe ku ji wan gotinan jî fêm nekin. Herwiha bi projeyên takekesî jî nayê afirandin, belkî bi hevkariya berdewam û hevdîtinên rasteqîn pêk tê. Pêbawerî herwiha tê wateya ku em xelkê han bidin ji bo beşdariya di civakê de, rêzgirtina li çandên cuda, birêxistinkirina perwerdeyê û avakirina pirên hevkariyê di navbera dezgehên hikûmî û civakan de. Bi rêya van gavên han em dikarin bi hev re ewlehiya giştî ya civakê xurt bikin.

---

Pêbaweriya rastîn aramiya hiş û sebirê dixwaze. Carinan dibe ku xelk rastî tirs, dudilî an têgihîştinên şaş bên; tenê bi gotûbêjên vekirî û kiryarên baş mirov dikare gav bi gav wan astengiyan rake. Pêbawerî ne ew e ku hemû kes wek hev bin, belkî ew e ku mirov tevî cudahiyan rêz li hev bigirin û bi hev re pêşerojeke hevpar ava bikin.

---

Bi kurtî û kurmancî; hêza civakê ne ji peyvên rût, belkî ji wan mirovên ku di kiryarên xwe yên baş de berdewam in tê, heta di wan kêliyan de jî ku kes wan nabîne. Wê demê pêbawerî dibe tiştekî rasteqîn û her wê demê ye ku pêbawerî dibe tiştekî herdemî.



> Pêbawerî bi hêdî-hêdî tê avakirin, lê dibe ku bi lez û bez jî têk biçe

**Şaho Caf**
Rêveberê Giştî
Maahanmuuttajien Varautumis- ja Maanpuolustusyhdistys (MVM)
Helsingin suojeluskuntatalo, Döbelninkatu 2, Helsinki

## Sergotar

# Ewlehî, qada me ya nû ya girîngiyê

Îro ewlehî ji bo xelkê Fînlandiyayê di rêza pêş de ye, heta ji armancên avhewayê jî girîngtir e. Divê em bi hev re bersiva vê guhertinê bidin



Hejmara duyem a kovar «KANTAMA» di demekê de derdikeve, ku têgihiştina xelkê Fînlandiyayê ya li ser ewlehiyê û rola Yekîtiya Ewropayê, guhertineke dîrokî bi xwe ve dîtiye. Rêpirsiyeke nû ya «Sitra» (Fona Cejna Serxwebûnê ya Fînlandiyayê) û «EVA» (Rêxistina Şêwirmendiya Bazirganiyê), arasteyeke neçaverêkirî eşkere dike: Xelkê Fînlandiyayê niha ewlehiyê ji armancên jîngehparêziyê jî girîngtir dibînin. Êdî ji Yekîtiya Ewropayê ne tenê pêşketina aborî tê xwestin, herwiha tê payîn ku karibe welatên endam biparêze û girêdayîbûna teknolojîk a bi zilhêzên wekî Çîn û Amerîkayê kêm bike.

Ev guhertina di bîrkirinê de, rengvedanek xurt li ser karên «Komeleya Amadekarî û Berevaniya Niştimanî ya Koçberan» (MVM) heye. Dema ku 74%ê xelkê Fînlandiyayê dixwazin binesaziyên hestiyar wekî çavkaniyeke ewlehiya niştimanî bên parastin, zelal e ku seqamgîrî û pêbawerî, bingehên xurt ên civaka me ne. Di çarçoveya «Ewlehiya Giştî» (Kokonaisturvallisuus) de, beşdarbûn û amadekariya koçberan roleke yekalîker dileyize. Em ne tenê armanca wergirtina zanyariyan in, em pispor û çalakvanên karîger ên vê qadê ne.

> “Ewlehî mijareke hevpar e; em wê bi hevkarî ava dikin”



**74%**

xelkê Fînlandiyayê parastina binesaziyên girîng wekî çavkaniyeke girîng a ewlehiya dewletê dibînin



Kovar: Sitra ja EVA, bihar 2026



Armanca MVM ew e ku piştrast be ku astengên ziman an çandê, nabin rêgir li ber jiyaneke ewle. Amadekarî, zimanekî hevpar e ku divê her kes, bêyî ku li paşeroja xwe binêre, fêr bibe. Dema ku koçber beşdarî çalakiyên xwezî yên ewlehiyê dibin, şiyana berevaniya tevahiya Fînlandiyayê ya li hemberî qeyranan û herwiha giyanê civakî xurtir dibe. Ewlehî pirseke hevpar e ku bi rêya hevkariyê çê dibe. Bi derbaskirina rewşa «temaşevanbûnê» û bûna «çalakvanên karîger», em civakeke xurtir û aramtir ji bo me hemûyan ava dikin

Rênimayiya Xweamadekirinê

# BERIYA HATINA HAVÎNÊ, ZANYARIYÊN XWE YÊN GIRÎNG KONTROL BIKE

Di havîna Fînlandiyayê de gelek kes geştan dikin, wextê xwe li xaniyên havînê (mökki), di çalakiyan de an jî bi giştî li derveyî malê derbas dikin. Ji ber vê yekê, meha Gulanê dema herî guncav e ku mirov bisekine û bifikire ka çawa xwe ji wan rewşên ku dibe ku mirov li cihekî xerîb be û tişt ne li gorî planan biçin, amade bike.

**Gelo tu dizanî heke di cihê geşta te de krîzek an rewşeke awarte çêbibe, divê tu ji kû derê zanyariyên pêbawer werbigirî?**

**Heke pasaporta te li derveyî welat winda bibe, çi?**

**Heke dayîna bi kart sernekeve an înternet kar neke, tu dê çawa tevbigerî?**

**Heke mobîla te winda bibe an pîla wê xilas bibe, tu dê çi bikî?**



## 1 Belgeyên xwe rêk û pêk bike



Piştrast bibe ku pasaport, karta nasnameyê û destûra te ya rûniştinê ne bi ser çûne. Di geştên navneteweyî de, li hin welatan pêwîst e ku belgeyên te piştî vegerê jî çend mehan derbasdar bin. Heke tu li Ewropayê geşt dikî, piştrast bibe ku Karta Tenduristiyê ya Ewropî (EHIC) bi te re ye. Tu dikarî vê bêpere ji «Kela»yê werbigirî.

Herwiha, wêneya pasaport an karta nasnameya xwe bikişîne û li cihekî cuda ji belgeya eslî hilîne, bo nimûne di çenteyekî din de an jî bi awayekî dîjîtal di mobîla xwe de. Heke belgeyên te winda bibin, ew wêne karên te yên peywendîkirina bi polîs û nûneratiya Fînlandiyayê re hêsantir dike.

## 2 Hejmarên giring binivîse

Hejmarên giring li ser kaxezekê binivîse: Endamên malbatê, hevalên geştê, cihê mayînê, şîrketa bîmeyê, hejmara betalkirina kartan, navenda tenduristiyê ya xwe, û heke pêwîst be, hejmara nûneratiya Fînlandiyayê an têlefona rewşên awarte ya Wezareta Derve.

Lîsteyekê li malê deyne û yekê jî di çenteyê xwe de an li cem hevjînê xwe deynin. Heke mobîla te winda bibe an pîla wê xilas bibe, tu dikarî wan hejmaran bi kar bînî.



## 3 Ji bo geştên derveyî welat xwe amade bike

Beriya ku biçî derveyî welat, rêzikên geştkirinê yên wî welatî kontrol bike û «Agahdarkirina Geştê» (Matkustusilmoitus) ji bo Wezareta Derve bişîne. Tu dikarî vê bi rêya malpera matkustusilmoitus.fi an sepana «112 Suomi» bikî.

Herwiha bîmeya geşta xwe kontrol bike: Gelo bîmeya te li wî welatî kar dike? Çi qerebû dike? Û hejmara xizmetguzariya awarte ya şîrketa bîmeyê li kû derê ye?




## 4 Kêmek pereyê kaxez (kash) bi te re be

Di dema qeyranan de dibe ku dayîna bi kart an banka înternetê kar neke. Ji ber vê yekê baş e ku hinek pereyê kaxez li cem te hebe ji bo pêdiviyên sereke yên wekî xwarin, derman an veguhastinê.



## 5 Planên xwe ji nêzîkên xwe re bibêje

Heke tu ji bo demekî dirêj diçî geştê, ji kesekî nêzîk re bibêje tu li kû yî û çawa dikarin xwe bigihînin te. Daxwaz ji kesekî bike ku carnan li xaniyê te binêre, sindoqên posteyê vala bike an perdeyên pencereyan biguhere, da ku dizên potansiyel nefikirin ku xanî vala ye.



**Xweamadekirina baş ne bi wateya tirsê ye**

belkî bi wateya wê ye ku te pêşwext bifikiriye ku heke rewş neyê xwestin û her tişt ne bi rêkûpêk biçe, tu dê çawa tevbigerî

Jin di refên pêşî de

# Ewlehî berpirsiyariya me hemûyan e

Gelek ji wan heval û nasên min ên ku bi salan e min nas dikin, dibe ku hinekî şaş mane ku min dest bi çalakiyên girêdayî «xweamadekirinê», «berevaniya niştimanî» û «ewlehiyê» kiriye. Ez pir baş ji vê yekê fêm dikim. Bi rastî, van mijaran berê ji min re dûr bûn. Ez ne ew kes bûm ku bi xwezaya xwe ber bi van mijaran ve biçe.

Lê belê, ez bawer im ku heman ew heval û nasên min, min wekî keseke «berpirsyar» nas dikin û belkî naveroka sereke ya vê mijarê jî ev be. Ewlehî ne tenê karê desthilatdaran, pisporan an kesekî «din» e; ew erkê her yek ji me ye. Di jiyana me ya rojane de, di biryarên ku em didin de û di awayê ku em pê re tevdigerin de, ewlehî heye.

Ez di vê çalakiyê de beşdar im, ji ber ku ez xêrxwaz im. Ez ji wî welatê ku ez tê de dijîm hez dikim, ez xêrxwaza mala xwe û malbata xwe me. Ez dixwazim bizanim ku di dema rûdana her rewşeke neasayî de, ez çawa dikarim bi awayekî rast tevbigerim.

Ez dixwazim bang li hemû jinên ku xwedî vê bîr û baweriyê ne bikim; yên ku dizanin ev welat mala me hemûyan e. Em xêrxwaz in û em dixwazin bi awayê xwe piştgiriya ewlehiya vî welatî bikin. Gelek ji we jixwe vî karî dikin: bi xêrxwaziya li hember malbatên xwe, bi alîkariya kesên din, bi berpirsyariya di jiyana rojane de, bi fêrbûna ziman, bi avakirina pêbaweriyê û bi bûna parçeyek ji vê civakê.




Ez bi vî rengî difikirim, mîna wê kurdela (ruban) pembe ya ku ji bo şêrpanya memikan tê bikaranîn. Gava kesek wê bikar tîne, ew ne tenê nîşaneke biçûk e, belkî dibêje: «Ev mijar têkiliya wê bi min re heye, ez xêrxwaz im û ez dixwazim beşdar bim.» Bi heman awayî, logoya me jî dikare vê peyamê bigihîne: Ez ne tenê temaşevan im, ez çalakvaneke karîger im di vê civakê de. Ez xêrxwaz im û ez berpirsyariyan distînim.



*Bi kêfxweşî ez dikarim ragihînim ku me dest bi dîzaynkirina berhemên ku logoya komeleya me li ser e, kiriye. Zû dê endamên komeleya me karibin bi rêya malpera me wan daxwaz bikin. Ji bo min, ew ne tenê kelûpel in, ew rêyeke ji bo nîşandana yekbûn û xêrxwaziyê ne*

> Ez ne temaşevanek im. Ez endameke çalak a vê civakê me.
> Ji min re ne bê cudahî ye — ez berpirsiyarî digirim ser xwe



ÇALAKÎ

# Zimanê hevpar ewlehiyê xurt dike:

## perwerdehiya koçberan ji bo amadekariya krîzan bersiva pêdiviyên îroyîn e

Bilindkirina hişyariya civakên koçberan di warê ewlehî û amadekariya ji bo rewşên krîzê de bûye beşeke girîng a ewlehiya berfireh a Fînlandiyayê. Civîna agahdarkirinê ya ku di meha gulanê de hat lidarxistin, nûnerên civaka kurdî û pisporên sereke yên welêt di warê ewlehiyê de anîn ba hev. Di civînê de hate gotûbêj kirin ka em çawa dikarin berxwedana civakê li hember krîzan bi hev re xurt bikin — bi derbaskirina astengên zimanî û çandî.



Li Fînlandiyayê semînereke agahdarkirinê li ser amadekarî û ewlehiya civakî hate lidarxistin

Di çarçoveya hewldanên berdewam ên ji bo bilindkirina asta hişyariyê û amadebûna civaka koçberan a li Fînlandiyayê de, bi destpêşxeriya rêxistina «Amadebûn û Berevaniya Niştimanî ya Koçberan (MVM ry)» û bi hevkariya «Federasyona Kurdên Fînlandiyayê», roja çarşemê 13ê gulana 2026an, semînereke agahdarkirinê ya giring di bin navê «Pêwîstiya Zimanekî Hevpar ji bo Ewlehiya Civakî» de ji bo hejmarek endamên civaka kurd li vî welatî hate lidarxistin.

Di vê semînerê de, ku ji aliyê perwerdekar Farîba Welîzade ve dihat birêvebirin, hejmarek pispor û nûnerên dezgehên fermî yên têkildarî ewlehiya neteweyî û parastina sivîl a Fînlandiyayê amade bûn û li ser xizmetguzariyên xwe yên di warê amadekarî û ewlehiya civakî de axivîn.

> “MVM di navbera desthilatdarên Fînlandiyayê yên berpirsiyar ji amadekariya krîzan û civakên koçberan de wekî pireke girîng a ragihandinê kar dike. Em kurs û perwerdehiyan li dar dixin, da ku koçber xwedî şiyanên pratîkî û amadekariya rast bin ku wekî beşek ji civaka Fînlandiyayê tev bigerin — her wiha di rewşên krîzê de jî”
>
> Şaho Caf
>
> Rêveberê Giştî yê MVM

### PIRD DI NAVBERA KOÇBER Û DEZGEHÊN FERMÎ DE

Destpêka semînerê bi axaftina Şaho Caf, Rêveberê Giştî yê rêxistina MVM dest pê kir. Caf bi berfirehî li ser armanc û sedemên civakî, siyasî û derûnî yên avakirina MVMê rawestiya. Navborî tekez kir ku rêxistina wan wekî pirdeke giring a pêwendiyê di navbera dezgehên ewlehiya Fînlandiyayê û civaka koçberan de kar dike û behsa wan xulên rahênanê yên ku ji bo koçberan saz dikin, kir

### HÊZA HEVKARÎ Û YEKITIYÊ

Paşê, Hîwa Şwanî, Serokê Federasyona Kurdên Fînlandiyayê, axivî. Şwanî di axaftina xwe de giringî û pêwîstiya hevkariya civaka kurd bi rêxistina MVMê re bilind nirxand, bi mebesta bilindkirina asta zanyarî, hişyarî û amadebûna endamên civaka kurd li Fînlandiyayê ji bo rûbirûbûna her rewşeke neyînî.

## BINGEHÊN EWLEHIYA GIŞTÎ Û PARASTINA SIVÎL

**Pispor û nûnerên dezgehên fermî yên Fînlandiyayê semîner bi pêşkêşkirina çend mijarên giring dewlemend kirin:**

### BIHÊZKIRINA ŞIYANA CIVAKÊ DI DEMA KRÎZAN DE

Karî Pîetîlaînen, Rêveberê Rahênanê li Komeleya Niştimanî ya Rahênana Berevaniyê (MPK), behsa çalakiyên rêxistina xwe kir. Pîetîlaînen anî ziman ku MPK kar dike ji bo zêdekirina şiyana civakê ya li hember krîzan û bilindkirina asta hişyariya welatiyan. Herwiha li ser awayê hevkariya di navbera MPK û MVMê de rawestiya.

### PLANGERÎ Û PARASTINA NIŞTECÎHAN LI HELSINKIYÊ

Valtterî Jokela, rêveber û planerê payebilind ê çavdêriyê li Rêveberiya Rewşên Awarte ya Şaredariya Helsinkiyê, xizmetguzariyên dezgeha xwe eşkere kir. Jokela got: «Di rewşên asayî de em planan datînin û çavdêriya stargehan dikin, di demên neasayî de jî em çalakiyan bi rê ve dibin.»

### KUNCIKÊN EWLEHIYA GIŞTÎ

Axêverê sêyem Anttî Pekko Puhakka, berpirsê ewlehiya navxweyî li Wezareta Navxwe, mijara «Ewlehiya Giştî û Berevaniya Sivîl» pêşkêş kir. Wî bingehên ewlehiya civaka Fînlandiyayê û şêwazên xweamadekirinê yên di dema krîzan de ji beşdaran re şirove kir.

### SEMÎNER JI ALIYÊ BEŞDARAN VE BI GERMÎ HATE PÊŞWAZÎKIRIN

Beşdaran tekez kirin ku lidarxistina van semîneran li gorî rewşa siyasî û ewlehiyê ya Ewropa û Fînlandiyayê, bi taybetî piştî şerê li Ukraynayê û aloziyên cîhanî, gelek giring û pêwîst e.

## DENGÊ CIWANAN

**Hejmara ciwanên xwedî paşxaneya koçberiyê ku leşkeriyê dikin, zêde dibe. Lê belê beşdarbûna wan di amadekariya ji bo krîzan, alîkariya dilxwazî û ewlehiya civakî de hîn jî pêdivî bi piştgirî û xurtkirina çalak heye.**



*Ji bo me, ciwan ne tenê yek ji komên armanc in. Ciwan di navenda xebata me de ne. Ev ne tenê prensîpek e: seroka komeleya me jî bixwe girêdayî vê komê ye*

Leşkerî û çalakiyên dilxwazî yên di warê parastina niştimanî de dikarin piştgirî bidin tevlêbûna ciwanên xwedî paşxaneya koçberiyê di civakê de. Mînakî, ew dikarin alîkar bin ku şiyanên girîng ji bo jiyana kar, zanîna ziman, têkiliyên civakî û hesta girêdayîbûnê bi civakê re xurt bibin. Di heman demê de girîng e ku em fêm bikin ku ciwan dikarin li ser vê mijarê xwedî pêşdarazî, bêewlehî an heta tirs bin. Ev dikare ji ezmûnên berê, bandora derdora nêzîk an kêmbûna agahiyê derkeve holê.

### *Me bi seroka komeleya xwe re axivî ka çawa nêrînên wê li ser leşkerî, şer û rewşên krîzê bi demê re guherîne.*



**MARI PAUKKU**
Seroka komeleyê, MVM ry

> *Mijar ne tenê artêş an çek e. Mijar her wiha ew e ka em dikarin alîkariya hev bikin, aram bimînin, berpirsiyarî bigirin ser xwe û dema tiştekî neçaverêkirî diqewime, bi awayekî rast tev bigerin*

Dema ku min şopand û beşdarî geşbûna MVM'ê bûm, min neçar ma li ser tiştên ku heke ez neçûbûma wir min ê qet bi vê kûrahiyê li ser wan nefikirîbû, bifikirim. Şer, krîz, artêş û berevaniya niştimanî ji bo min ne mijarên hêsan bûn. Di dema jiyana xwe de, têkiliya min bi artêşê re gelek caran guherî û ramanên min ji aliyekî çûne aliyê din.

Di dilê min de her tim daxwazeke xurt hebûye ku mirov bikarin bi aştiyê bijîn, hevûdu fêm bikin û bêyî tirs ji şer an tundûtûjiyê balê bikişînin ser avakirina jiyana xwe. Ew fikir qet wenda nebûye. Berevajî vê, belkî hîn xurttir bûye.

Di heman demê de, min neçar ma qebûl bikim ku cîhan di şeveкê de naguheze. Her çend ez dixwazim ku aştî ji bo her kesî bijartineke xweser be, rastî her dem nîşanî me dide ku krîz çêdibin, ewlehî tê hejandin û divê mirov zanibin di rewşên zehmet de jî çawa tevbigerin.

Di sala dawî de, min dest pê kir ku bi çavekî nû li berevaniya niştimanî û amadebûna ji bo krîzan binerim. Mijar ne tenê artêş an çek in. Mijar ev e ku em dikarin alîkariya hev bikin, aram bimînin, berpirsiyariyê hildin ser xwe û di dema bûyerên neçaverêkirî de kar bikin.

Her çend berevaniya niştimanî bi aliyê erka xwe ve tê girêdan, divê ew ji bo hemû kesên ku dixwazin beşdarî xurtkirina ewlehiya civakê bibin, derfetek be. Ya girîngtir, ez difikirim ku divê herî zêde em fêr bibin ka di rewşên krîzê de çawa tevbigerin — bêyî ku paşxane, zayend an jî ew kes çûbe serbaziyê an na, bibe asteng.

Ez hêvî dikim ku ew kesên ku beşdarî xizmeta serbazî an çalakiyên dilxwazî yên berevaniya niştimanî dibin, wê berî her tiştî wekî erkeş berpirsiyar bibînin. Ne wekî derfetek ji bo pîrozkirina çekan an hêzê, lê wekî rêyek ji bo parastina jiyanê, civakê û kesên ku hewcedariya wan bi alîkariyê heye.

Ez bawer dikim ku li Fînlandiyayê artêş ji bo berevaniya niştimanî heye, ne ji bo êrîşkirinê. Ji ber vê yekê ji bo min girîng e ku em bikarin li ser berevaniya niştimanî û amadebûna ji bo krîzan, ji perspektîfa aştiyê, berpirsiyariyê û wekheviyê jî biaxivin.

Di cîhanê de dikarin cureyên curbecur ên krîzan rû bidin, ne tenê şer. Dibe ku karesatên xwezayî, qutbûna elektrîkê, êrîşên sîber, pandemî an rewşên ku jiyana asayî ya civakê têk diçe rû bidin. Di wê demê de ne bes e ku tenê komek mirov bizanin divê çi bikin. Divê amadebûna ji bo krîzan mafê her kesî be.



**MVM dixwaze ji bo vê yekê bixebite ku bêtir ciwan rêya xwe ji bo beşdariya di amadebûna ji bo krîzan, alîkariya dilxwazî û ewlehiya civakî de bibînin.**

**Ev kar berî her tiştî li ser asta bingehîn (giya) tê kirin: bi hevdîtina bi ciwanan re, guhdarkirina pirsên wan û avakirina baweriyê.**

*Gava ku ciwanek hîs dike ku girêdayî vê civakê ye, hingê ew dikare ewlehî, alîkarî û parastinê jî wekî beşek ji nasnameya xwe bibîne.*

### BI HEV RE EM PÊŞEROJEKE EWLE AVA DIKIN

**ENCAM**
Dengê ciwanan tê bihîstin. Ciwan beşdarî plankirin û pêşxistina çalakiyan dibin

**PÊBAWERÎ**
Ragihandina vekirî û nêzîkbûna bi rêzdarî alîkar dikin ku di navbera ciwanan û nûnerên desthilatê de baweri bê avakirin

**EWLEHÎ**
Zanîn, şiyan û amadekarî alîkar dikin ku ciwan di dema krîzan de, bi hev re, bi baweriyeke mezintir tev bigerin

**BERPIRSIYARÎ**
Her kes dikare bandorê bike. Heta karên biçûk ên rojane jî alîkar dikin ku civakeke xurtir û berxwedêrtir bê avakirin

**PÊŞEROJ**
Bi hev re — ber bi armanceke hevpar ve: Fînlandiyayeke ewle, dadmend û yekgirtî

## Hesta pêkvebûnê kilîta entegrasyonê ye

Kuncika Pisporan

# Ewlehiya Fînlandiyayê ya me hemûyan e

Ewlehiya Fînlandiyayê beriya her tiştî li ser bingehên pêbaweriyê, berpirsyariya hevpar û wê yekê hatiye avakirin ku em kesî li derveyî vê çarçoveyê nehêlin.
Lewma xebata «Rêxistina Amadebûn û Berevaniya Niştimanî ya Koçberan (MVM ry)» ji bo ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê gelek giring e.



Ewlehî ne tenê bi rêya desthilatdaran, hêzên berevaniyê an biryarên siyasî pêk tê, belkî di jiyana rojane de tê afirandin. Ew di wê yekê de ye ku mirov dizanin di dema rewşên neasayî de çawa tevbigerin, têdigihîjin ka civak çawa kar dike û hest dikin ku ew beşek in ji Fînlandiyayê û ewlehiya wê. Çavkaniya herî giring a hêza ewlehiya giştî, mirov bixwe ne.

Fînlandiyayê kevneşopiyeke dûr û dirêj a «vîna berevaniya niştimanî» û «berxwedana civakê li hember krîzan» heye. Di asta navneteweyî de, modela ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê wekî xaleke hêzê tê dîtin. Di navenda vê modelê de ev bîrdoz heye ku ewlehî bi hevkarî tê avakirin: bi hevkariya di navbera desthilatdaran, kompaniyan, rêxistinan û welatiyan de.

Di vê çarçoveya giştî de, MVM ry beşdariyeke gelek giring dike.

Giring e ku koçberên li Fînlandiyayê niştecî ne, karibin bi awayekî xwebexş beşdarî karên ewlehî, xweamadekirin û berevaniya niştimanî bibin. Di heman demê de yekgirtin û pêbaweriya civakê jî xurtir dibe. Hesta ewlehiyê ji wê yekê tê ku mirov hest dikin ew ser bi civakekê ne û beşek in ji pêşerojeke hevpar.

> ***Ewlehî divê qet neyê dabeşkirin wekî "em" û "ewên din". Ewlehiya Fînlandiyayê berpirsiyariya me hemûyan e***

Divê ewlehî tu carî neyê dabeşkirin bo «em» û «ew». Ewlehiya Fînlandiyayê pirsa me hemûyan e. Jîngeha ewlehiyê ya îro bi lez diguhere. Bandorên hîbrîd (tevlihev), gefên sîber, bandora zanyariyan û pêşketina teknolojiyê, hemû civakê eleqedar dikin. Di heman demê de di dema krîzan de, şiyana kirdeyî ya mirovan, xweamadekirin û şiyana karê hevpar giringiya xwe derdixin pêş. Lewma pêwîst e zanyariyên ewlehî û xweamadekirinê bigihîjin destê her takekesekî li Fînlandiyayê.

Di çalakiyên MVM ry de girîngî bi aliyê kirdeyî tê dayîn. Ewlehî ne tenê stratejî an gotarên xemilandî ne, belkî ji şarezayiya berbiçav, perwerde, hevkarî û avakirina pêbaweriyê pêk tê. Her mirovekî rahênandî bi vî karê xwe, berxwedana Fînlandiyayê ya li hember krîzan xurtir dike.

Civaka Fînlandiyayê wê demê xurt e ku mirov hest dikin ew beşdar in di avakirina wê de. Giyanê berevaniya niştimanî bi zorê nayê afirandin, belkî ji wê ezmûnê tê ku ev welat ya me hemûyan e û hêjayî parastinê ye.



Ez bi xwe demek dirêj e di warê ewlehî, ewlehiya giştî û berevaniya niştimanî de dixebitim. Lewma ez baş dizanim ku ewlehî tu carî bi dawî nabe. Ew her roj bi hev re tê avakirin. Di heman demê de ez dizanim ku hêza Fînlandiyayê her tim di wê şiyanê de bûye ku di demên dijwar de li hev bicivin.

Ji bo vê jî, ez xebata MVM ry wekî xebateke gelek biqîmet û giring dibînim.

Ewlehî ya me hemûyan e û gava ewlehî bi hevkarî were avakirin, Fînlandiya jî xurtir dibe.

**Jarno Limnéll**

# Ewlehiya Hevpar Pêdiviya Hemûyan e

**Ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê li ser bingeha hevkariya di navbera desthilatdar, rêxistin û kesan de tê avakirin. Şarezayiya her kesekî dikare giring be, dema ku civak rastî krîzan an rewşên neasayî tê.**

Di vê hevpeyvînê de, Anttî **Pekko Puhakka**, ku di warê ewlehiya navxweyî de kar dike, vedibêje ka çima wî dema xwe ji bo xebata xwebexş a parastina sivîlan û xweamadekirinê terxan kiriye — û çima şiyanên kesên xwedî paşxaneya koçberiyê jî ji bo xurtkirina ewlehiya hevpar pêwîst in.




## GIRINGIYA XEBATA XWEBEXŞ JI BO EWLEHIYA GIŞTÎ

### Paşxaneya min:

Ez karmendekî xwedî ezmûn im û min di hemû astên rêveberiyê de kar kiriye; di rêveberiya herêmî, navçeyî û niha jî çend sal in li rêveberiya dewletê kar dikim. Ji aliyê xwendinê ve, ez endezyarekî xwedî dîdgeha ewlehiyê û şarezayê zanistên mirovî me. Min piraniya xwendina xwe li Skotlandê qedandiye û pênc salan li wir jiyam. Beriya ku vegerim Fînlandiyayê, min demekê li Holanda û Macarîstanê jî derbas kir. Ez pir hez dikim mirovên cuda nas bikim, bi taybetî wekî takekes. Niha li Wezareta Navxwe ez li ser karûbarên berpirsên ewlehiya navxweyî ya Fînlandiyayê kar dikim.

### Xebata xwebexş:

Min beşeke mezin a dema xwe ya xwebexş ji bo projeyên cuda yên têkildarî ewlehiya giştî ya civaka me terxan kiriye. Gava Rûsyayê di sala 2022an de şerê hovane û êrîşa berfireh bo ser Ukraynayê dest pê kir, daxwaza xelkê Fînlandiyayê, bi taybetî ji bo parastina sivîlan, gelek zêde bû. Helsinkî kevneşopiyeke dûr û dirêj a perwerdeya parastina sivîl heye, lê ew daxwaza ku ji bihara 2022an ve çêbû, pêdivî bi mezinkirina asta çalakiyan hebû. Sûcên şer ên Rûsyayê yên li dijî sivîlên Ukraynayê, handerekî sereke bûn ku ez jî dest bi vî karî bikim.

Di nav salan de, rola min di vê çalakiya xwebexş de bûye roleke diyar. «Komeleya Rahênana Berevaniya Niştimanî (MPK)» çarçoveya çalakiyan dabîn dike û komeke berfireh a xulên leşkerî, sivîl û piştevaniya berpirsan pêşkêş dike. Di wan rahênanan de ez bi komeke mirovên cuda re rûbirû dibim ku dixwazin zanyarî û şiyanên xwe pêş bixin da ku amadebûna me ya hevpar a ji bo rûbirûbûna rewşên neasayî baştir be. Modela ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê li ser wê bingehê hatiye avakirin ku takekes bixwe berpirsyariya amadebûn û xweamadekirina xwe hildigirin. Her kesek dikare bi pêşxistina zanyarî û şiyanên xwe, amadebûna me ya hevpar xurt bike; ew şiyanên ku di demên neasayî de dikarin ji bo me hemûyan sûdbexş bin.

*Modela ewlehiya berfireh a Fînlandiyayê li ser berpirsiyariya her kesî ji bo amadekariya xwe tê avakirin. Her yek ji me dikare ewlehiya hevpar xurt bike, bi pêşxistina zanîn û şiyanên xwe. Lewra di rewşeke awarte de, heta ezmûna mirov di warê xwe de jî dikare ji bo kesên din girîng û sûdmend be*

### Şîreta min ji bo xwendevanên xwedî paşxaneya koçberiyê:

Bê tirs bin di naskirina mirovan de wekî takekes; ev şîret ji bo hemûyan rast e. Bîrkirina «em û ew» ji bo mirov tiştekî xwezayî ye, lê ji bo birêveçûna civakê pir giring e ku em bikarin xalên hevpar û mijarên giring bibînin. Em dikarin bi hev re xurtir bin.

Bê tirs bin. Zanyarî û şiyanên xwe pêş bixin. Civaka me pêdiviya wê bi hemû takekesan heye, bêyî ku li paşxaneya wan binêre. Em hemû xwediyê wan şiyanan in ku di demên teng de dikarin alîkariya kesên din jî bikin. Civaka Fînlandiyayê hêjayî parastinê ye. Tu bêguman şarezayê çendîn tiştên sûdbexş î ku ez jê ne şareza me.



ROJEV

# Rengvedana çalakiyên MVM-ê di medyayên Fînlandiyayê de

## Koçber dibin beşdarên çalak di avakirina ewlekariyê de




Di gotarek berfireh de, kovara fînlandî "Suomen Sotilas" (hejmar 4/2026) bi awayekî berbiçav ronî xistiye ser xebata biqîmet ya ku "Rêxistina Amadebûn û Berevaniya Niştimanî ya Koçberan" (MVM ry) dike. Çalakiyên vê rêxistinê di medya û civaka Fînlandiyayê de bi awayekî pir erênî hatine pêşwazîkirin û tê dîtin ku ewlekariya giştî ya tevahiya welêt bihêztir dike.
Di gotarê de tê tekez kirin ku rêxistina (MVM ry) valahiyek girîng di amadebûna Fînlandiyayê de tijî dike. Bi serokatiya rêveberê cîbicîkar "Şaxewan Caf", rêxistin piştrast dike ku agahiyên derbarê çawaniya xebatê di demên qeyranê de, digihîje destê wan kesên ku eslê wan koçber e.




**Caf naveroka peyama rêxistinê bi vî awayî kurt dike:**

> *"Em Fînlandiyayekê ava dikin ku tê de her niştecî bibe beşek ji çareseriyê, ne tenê wek kesekê ku pêwîstiya wî bi alîkariyê hebe bê dîtin."*

Van çalakiyan piştgiriyek xurt ji aliyê biryarderên payebilind ve wergirtiye. Paula Werning û Jarno Limnéll, endamên parlamentoyê û komîteya berevaniyê, di kovarê de pesna (MVM ry) didin wek avakarê berxwedana civakê. Li gorî wan, ev rêxistin wek pirekê girîng kar dike û alîkarî dike ku sûd ji şiyanên zimanî û çandî yên koçberan were wergirtin, ew şiyanên ku berê civaka Fînlandiyayê nizanibû bi temamî sûdê ji wan werbigire.




Ev pêşwaziya erênî di leza tevlêbûna bi qada fermî ya ewlekariyê de jî reng daye. (MVM ry) hevkariyekî berfireh di warê perwerdeyê de bi "Rêxistina Perwerdehiya Berevaniya Niştimanî" (MPK) re dike û niha bûye endamê "Komeleya Rêxistinên Berevaniya Niştimanî". Her wiha rêxistin bi rêya kovara dîjîtal (Kantama) ku wê bi xwe ava kiriye, agahiyan belav dike. Gotara kovara (Suomen Sotilas) bi zelalî dide xuyakirin ku di civaka me de pêwîstiyek mezin bi xebatên (MVM ry) hebûye.

**Gotara tevahî li vir bixwînin: Suomen Sotilas 4/2026**
**www.suomensotilas.fi**

ROJEV

# Daxuyaniya Encûmena SPEK:

# Ragihandina metirsiyan pêş bixin û ewlehiya hevpar xurt bikin

Li vir em helwesta «Federasyona Navendî ya Pîşeya Ferîyaguzariyê ya Fînlandiyayê» (SPEK) parve dikin, ku behsa pêşxistina hişyarkirina metirsiyan û bihêzkirina ewlehiya giştî dike. Ev daxuyanî tîrêjê diavêje ser wê yekê ku çawa hişyariyên metirsiyê divê bigihîjin destê her kesê li Fînlandiyayê dijî û hatûçû dike — bi wan kesan re jî ku xwedî ziman û koman cuda ne.

Ji bo kovara «Kantama», ev mijar gelek giring e; çimkî gihîştina bi zanyariyên ewlehiyê, bikaranîna zimanekî sade û piralî, şertên sereke ne ji bo ku her kesek bikaribe di dema metirsiyê de bi awayekî rast tevbigerin

### Daxuyaniya Encumena Federasyona Navendî ya Pîşeya Ferîyaguzariyê ya Fînlandiyayê (SPEK)

Wê hişyariya roja înê li «Uusimaa»yê derbarê firokeyeke bêfirokevan (dron) de ku ber bi Fînlandiyayê ve dihat, pêwîstiya lezgîn a pergaleke karîger a hişyarkirina metirsiyan eşkere kir, da ku hişyarî bi awayekî giştî bigihîjin hemû welatiyan. Hişyariya metirsiyê divê demildest bigihêje destê her kesê ku metirsî li ser wan heye, bêyî ku li rêkûpêkiyên teknîkî yên mobîlan an astengên din were nihêrtin.

Mari Rantanen, Wezîra Navxwe, ragihandiye ku ew lezê dikin di pêşxistina sîstema hişyarkirinê de. Têgihiştina encumena SPEK ew e ku divê sîstemeke karîger her çi zû ye dest bi kar bibe. Hîn jî gelek tişt hene ku beriya sala bê bên kirin. Niha dema wê ye ku em di vê rewşa benda manê de, hişyariya metirsiyê rêk bixin. Herwiha piştî kêmkirina metirsiyê jî, divê rewş bi awayekî guncav were çareserkirin.

> Agahdarkirina li ser metirsiyan divê hemû kesên ku li Fînlandiyayê dijîn an li welêt digerin bigire nav xwe. Komên zimanî yên cuda û komên armanc jî divê di vê agahdarkirinê de bên hesibandin

### Tenê sîstem ne bes e

Digel vê yekê, tu sîstem nabe alîkar heke di cîbicîkirina pêwendiyan de kêmasî hebin. Di dawiyê de, mesele ne tenê teknolojî ye, belkî bi wêneya hevpar a rewşê, hemahengî, serkirdetî, hevkarî, biryardan, rêwerzên karîger û parastina hesta ewlehiyê ve girêdayî ye.

Di hişyarkirina metirsiyê de divê li ber çavan were girtin ku komên cuda hene, wekî koçber, geştyar, kesên temenmezin, xwedîpêdiviyên taybet û zarok. Gelek dê û bav tûşî şokê bûn ku çawa dikarin bi zarokên xwe re li ser vê mijarê biaxivin. Divê rêwerz ji bo her kesî zelal û fêmkirî bin. Di lêkolîneke berê ya SPEK de, gelek kesan nîgeraniya xwe anîbûn ziman ku eger zarok bi tena xwe bin, çawa dikarin xwe di wê rewşê de rizgar bikin.

Hişyariyên metirsiyê divê wan kesan jî bigire nav xwe yên ku di navbera navçeyan de hatûçû dikin. Eger hişyariya metirsiyê tenê carekê ji bo wan were şandin ku li wê navçeyê ne, dibe ku negihêje destê wan ên ku nû ber bi wir ve diçin

### Ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê pêdivî bi hevkariya xurt heye

Gefên nû yên ewlehiyê, karê ferîyaguzariyê jî dixe ber aloziyan û girîngiya hevkariya çir a di navbera desthilatdar, kompaniyan, sektora sêyem (rêxistin) û welatiyan de derdixe holê. Hevdem bi başkirina hişyarkirina metirsiyan, divê hemahengiya rahênana amadebûnê û veguhertina zanyariyan jî xurtir bibe.

Divê bang li hemû aliyan were kirin ji bo beşdarbûna di rahênanan de, ji desthilatdaran bigire heta rêxistin û sektora bazirganiyê, çi di asta herêmî, navçeyî û çi di asta niştimanî de. Bi rêya rahênanê mirov dikare aloziyan pêşbîn bike û beriya ku metirsî rû bidin, bi hev re çareser bike.

Hevkariya xurt, dê bandorê li ser ewlehiya giştî ya Fînlandiyayê bike. Ji bilî hevkarî, divê piştrastbûn hebe di dabînkirina çavkaniyên pêwîst ji bo beşa ferîyaguzariyê. Niha dema wê ye ku em fêm bikin ku «Beşa Ferîyaguzariyê» faktoreke sereke ya ewlehiya navxweyî ye, ku di gelek rewşên metirsîdar de girîngiya wê zêdetir derdikeve holê.

> *Serokê Encumena Federasyona Navendî ya Pîşeya Ferîyaguzariyê ya Fînlandiyayê (SPEK)*
> **Paula Risikko**

Daxuyaniya tevahî dikarin li ser malpera SPEK bixwînin:
**www.spek.fi**